

## METELOK DI EDEBIYATA GELÊRÎ YA KURDÎ DE DIGEL HIN NIMÛNEYÊN JI DEVERA SÎPAN

Dr. Zafer Açar

### KURTE

Metelok cureyeke Edebiyata Kurdî ya Gelêrî ye ku ew di nava kurdan de bi navên cuda û ji bo gelek cureyan hatiye bikaranîn. Ew dikarin hem wekî helbestkî hem jî wekî pexşanî bin ku ev herdu şeweyên wê jî curedar in.

Di kurmançî de çî xebatên ferhengî bin çî jî lêkolîner bin levkirinek ser pênasikirina metelokan nehatiye kirin. Hinekan ew wekî biwêj an gotinên pêşyan hinekan ew wekî mamik û hinekan jî ew wekî çîrok/çîroka kurt û yan jî cureyeke din dane nasîn.

Di vê xebata xwe de piştî ku me peyva metelok û peyvên nêzwateyên wê di kurdî û çend zimanan de da ber hev, me hin nimûneyên metelokan û cureyên wekî wê (qewlik, beynok) pêşkeş kirin ku nimûneyên me ji Devera Sîpan hatine girtin.

Divê em vê jî bêjin ku xebata me armanca terîf û tesnîfkirina metelokan nake lê dixwaze balê bikişîne ser heyîna vê cureyê û terîfên wê yên cuda.

**Peyvên Sereke:** Metelok, Metele, Qewlik, Beynok, Edebiyata Kurdi ya Gelêri

## KÛRT HALK EDEBİYATINDA METELOK TÜRÜ VE SÛPHAN DAĞI YÖRESİNDEN BAZI METELOK ÖRNEKLERİ

### ÖZET

Metelok Sözlü Kürt Edebiyatının bir türüdür ve Kürtler arasında farklı isimlerle ve farklı türler için kullanılır. Bu tür hem manzum hem de nesir şeklinde olabilir ve her iki şekil de kendi içinde çeşitli biçimlerde olabilir.

Kürtçe/Kurmançî de ister sözlük çalışması olsun ister yazarlar arasında olsun metelokların tanımlanmasında bir tanım birliği yoktur. Kimisi onları deyim yada atasözü biçiminde, kimisi bilmece şeklinde kimisi de öykü/kısa öykü yada başka bir tür şeklinde tanımlamışlardır.

Bu çalışmamızda metelok sözcüğünü ve bu sözcüğe yakın olan sözcükleri Kürtçede ve diğer birkaç dilde karşılaştırdıktan sonra, bu türden metelok veya ona yakın (Beynok, Qewlik) türlerinden örnekler sunduk ve örnekler için derlemelerimizi Süphan Dağı Yöresinden seçtik.

Şunu da belirtmek gerekir ki bu çalışma metelok türünü tanımlama veya sınıflandırmayı değil, böyle bir türün varlığına ve farklı tanımlamalara dikkat çekmeyi amaçlamaktadır.

**Anahtar Sözcükler:** Metelok, Metele, Qewlik, Beynok, Kürt Halk Edebiyatı

## METELOK IN KURDISH FOLK LITERATURE AND SOME SAMPLES OF METELOK FROM MOUNT SUPHAN REGION

### ABSTRACT

Metelok is a kind of oral Kurdish literature and is used by Kurds for different names and different species. This species can be in both verse and prose form, and both forms are separated into various species within themselves.

In Kurdish/Kurmanci there is no definition association in the definition of meteloks whether they are dictionary studies or authors. Some have described them in the form of idioms or proverbs, some in the form of riddles and some in the form of stories/short stories or an others form.

In this study, after comparing the word metelok and the words close to this word in kurdish and several other languages, we presented examples of this type and similar types like *beynok*, *qewlik* and selected our compilers for examples from Mount Suphan Region.

It should be noted that this study aims not to identify or classify the metelok type, but to draw attention to the existence of such a type and different definitions.

**Keywords:** Metelok, Mete, Beynok, Qewlik, Kurdish Folk Literature

### Destpêk

Edebiyata Gelêrî ya Kurdî wekî ku pisporen qadê û lêkolînerên ser dixebitin heqê wê teslîm kirine, dewlemend e û heta niha gelek xebat ser hatine kirin çî berhevok bin û çî jî xebatên analîz û lêkolînê bin. Îja ji bo ku cure û celebên vê edebiyatê gelek in û li gorî deverên kurdî carna navên cuda jî bi kar tên, berhevkirin û analîzkirina van cureyan girîngtir dibe. Ev xebat jî dixwaze cureyeke ji vegêrana devkî yan jî vegotina gelêrî<sup>1</sup> ‘metelok’ an pêşkeş bike ji Devera Sîpanê Xelatê û bala lêkolînerên vê qadê bikişîne ser metelokan.

Metelok, wekî têgeheke edebiyata devkî di folklorê kurdî de berbelav e lê hêj levkirineke giştî tune ye çî di warê pênaseya wê çî jî di warê naverok û tesnîfa cureyên wê de. Ev peyv jî aliyê peyvên nêzdeng û nêzwate ve jî peyveke navdar e ku gelek caran tûşî navandinên çewt bûye.

Di kurmancî de peyvên wekî; *mat*, *mit*, *metel* hene ku wateyên bêkarî, şaşbûn, rawestîna didin. Peyva *mat* di farisî de, yek; termeke lîstika kişîk/satrancê ye, du; rengê sar û bêşewq, sê;

<sup>1</sup> Binêre: Necat Keskin, *Folklor û Edebiyata Gelêrî*, weş: Avesta, r. 150, 2019, Stembol.

şaş, heyran, heyirî ye<sup>2</sup> ku di kurdî de jî bi vî awayî tê bikaranîn. Herwiha hevdenga vê peyvê peyveke fransî ye ku wateya rengê sar û bêşewq dide.<sup>3</sup> Wekî wê, di îngilizî de jî peyva *mat* an jî *matt* bi wateya navborî û peyva *matter* jî digel wateyên xwe yê din wateyên wekî *mijar* û *meseleyê* li xwe digire. Dîsa, di îngilizî de, peyveke nêzdege vî peyvê jî heye ku wekî *mute* tê zanîn û wateya neaxaftinê, bêdengbûnê heta bêzariyê de tê bikaranîn.<sup>4</sup> Li aliyekî din peyva *mit* li devera Semsûrê berbelav e ku di wateya rawestînê de tê bikaranîn. Heçî *metel* e ew jî li herêma Serhedê berbelav e û di maneya sekinandin û rawestînê de tê bikaranîn herwiha di wateya şaşmanê de tê bikaranîn ku wekî cotepeyvekê bi peyva *şaş* re tê bikaranîn wekî *şaş û metel*.

Eger em peyva ‘metelok’ê li ser morfemên ‘metel’ û ‘-ok’ê veqetînin; hingê koka peyvê wekî metel dimîne û paşgira *ok* jî -formeke wê ya din “-ik”- di kurdî de wateya biçûkkirin an jî şirînkirinê dide peyvê, herwiha ev paşgir wekî “-k” jî tê dawiya peyvan û wan dike navê hacet an eşyayekê wekî di peyvên zarok, mêrik, malik, xwelîdank û wd. de tê dîtin.

Li aliyekî din; eger təkiliya ‘metel/metelok’ê bi ‘mesel/mesele’ya erebî re hebe, ew di gelek wateyan de tê bikaranîn. Di ferhengê de, mîna; gotin, gotinê pêşyan, destan, çîrok, îbret, hucet, sifet hin wateyên vî peyvê ne.<sup>5</sup> Ev peyv di hebeşî de wekî *mesl*, aramî wekî *masla* û îbranî wekî *masal* e ku piştî bi wateya muqayeseyê ketiye zimanê erebî<sup>6</sup>, dûre wekî; *mesele*, *mîsal*, pirjimara wê *emsal*, ketiye zimanên din ên wekî kurdî, tirkî, farisî. Di farisî de *mesel* di tirkî de peyva *mesele*, *masal*, *mîsal* û *emsal* tînen bikaranîn ku di tirkî de *mesele* zêdetir wekî çîrokeke kurt an jî rûdanekê tê bikaranîn, *masal* jî ji bo çîrokên dirêj ên gelêrî tê bikaranîn. Heçî *mîsal* û *emsal* in ew jî di tirkîya osmanî de zêdetir dihatin bikaranîn ku îro hêj di tirkîyê de heye û di wateya teşbîhê de tê bikaranîn.

Di kurdî de peyva *mesele* di zimanê gel de heye û di wateya çîrok an jî rûdanekê kurt de tê bikaranîn. Lê wekî *metele* jî ev peyv di eynî wateyê de tê bikaranîn û forma wê ya *metelok* jî di wateyê nêzî wê de tê bikaranîn.

Metelok gelo peyveke kurdî yan îranî yan jî aryayî ye, yan jî ew ji ‘metel/mesel/mesele’ya zimanên samî ye em pê nizanin lê em dikarin bêjin ew zexm girêdayî peyvên wekî *metelman*, *matbûn*, *şaş û metel bûn/manê* ye. Çimkî cureyên edebiyata gelêrî ji ber zarê xwe yê xweş, wateyên xwe yê bihêz, naverokên xwe yê dewlemend herdem guhdarên xwe şaş û metel

<sup>2</sup> Farsça- Türkçe Sözlük, haz: Mehmet Kanar, Say Yayınları, s. 1326, İstanbul, 2008.

<sup>3</sup> [http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com\\_gts&arama=gts&guid=TDK.GTS.583f26e020cb87.58137696](http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com_gts&arama=gts&guid=TDK.GTS.583f26e020cb87.58137696), 30. 11. 2016 pêwendî hat kirin.

<sup>4</sup> Oxford Wordpower Dictionary, English-English- Turkish, Oxford University Press, 2012

<sup>5</sup> Arapça- Türkçe Lügat, haz: Arif Erkan, Yasin Yayınları, c. 2., s. 2075, İstanbul, 2004.

<sup>6</sup> Pınar Ünlüer, *Masalların Dînî Ve Ahlakî Değerler Açısından İncelenmesi (Billurköşk Masalları Örneği)*, Y.Lisans Tezi, Marmara Üniv. Sosyal Bilimler Enstitüsü, 2013, İstanbul.

hiştine. Heye ku təkiliya *metelokê* bi *mat/mit* û *metelên* kurdî re hebe lê ji bo vê zêdetir lêkolîn dixwazin, xweser jî lêkolînên sehayî.

### Çend Pênaseyên Cureya Metelokê ji hin Nivîskar û Berhemên Kurdî

Di kurdî de metelok li gorî herêman/zaraveyan maneyên cuda li xwe girtine û bo nimûne di kurmancî de ji bo gelek çeşnên edebiyata devkî hatiye bikaranîn. Di kurmancî de digel navên wê yên deverî ew carna ji bo çîrokên kurt, carna ji bo derbî meselan, carna ji bo mamikan, carna jî ji bo beynok<sup>7</sup> û qewlik<sup>8</sup>an hatiye bikaranîn. Herwiha ew bi şiklên xwe yên; *metel*, *metele* û *mesele* jî hatine bikaranîn.

Metelok di Ferhenga Enstîtuya Kurdî de wekî; ‘mesel, çîroka folklorîk a kurt, gotina pêşiyên a kurt, qisse, anekdot, pêkenok, wecîze, kelama kubar’ hatiye pênasekirin.<sup>9</sup> Di Ferhenga Îzolî de jî ev peyv wekî; gotinên pêşiyên û wecîze hatiye pênasekirin ku vê ferhengê peyva *metel* jî; wateya yekem wekî ‘mamik’, wateya duwem jî wekî ‘heyret’, ‘heyirî man’ bi kar aniye.<sup>10</sup> Di van herdu ferhengan de jî ev peyv hem wekî *metelok* hem jî wekî *methelok* cî digire. Dîsa di ferhenga Kovara Kurmancî de *metelok* (*methelok*) wekî; qisse, gotina pêşiyên derbas dibe.<sup>11</sup>

Di soranî de metelok wekî; ‘metell, hetelle, meyl, hellêne, çewçe’ tê bikaranîn. Li devera Behdînan jî peyva *metel* bo metelên mezinan (pendê pêşinan) *metelok* jî bo metelên zarokan tê bikaranîn.<sup>12</sup>

Di Ferhenga Etîmolojiyê de Ramazan Çeper peyvên *metel* û *metelok* wiha pênase kirine:

**Metel:** Şaşwaz, ecêbmayî..., Me+tel. **Me:** mirov/mordem/merdim. Tel/têl: du hêl. **Metel:** Mirovê ku du alî dimîne...

**Metelok:** Çîrok, meseleyên çîrokî. Metel+ok. Peyva metel ji peyva mesel a erebî hatiye çêkirin...<sup>13</sup>

Dîsa di xebata xwe ya berhevkirina metelokan de Mahir Bewarî wê wiha terîf dike: “Metelok beşekî herî girîng e ji folklorê, girêday torê zaroka ye. Metelok çend peyvên sivik û lêkday ne, pêkve tên girêdan, vehandin û darêjtin, di qalibê helbest/helbesta klasîk an pexşanê da, hevokên bi ser û ber lêkday, kurt, nazik, xwedî selîqe/awaz û bi qafiyê ye hwd.”

<sup>7</sup> Beynok: Dema kesek ji merivekî bixeyîde, jê sil be ew gotinan davêje ser piranî bi tehn, tinaz û tirane ne. (Jêgirtî 1., jêgirtî 3.)

<sup>8</sup> Qewlik: Dema gotina kesekî ya navdar bê guheztin bi qewlê wî tê gotin. Yan jî carna kes diyar nebe gotin an jî çîroka wî diyar be tê guheztin ew jî wekî qewlik tê bi navkirin. Heta kesê ku bi van cure gotinan tê naskirin wekî qewlikbêj hatine binavkirin. (Jêgirtî 1., jêgirtî 2., jêgirtî 4.)

<sup>9</sup> Ferhenga Kurdî- Tirkî, amd: Zana Farqînî, weş: Enstîtuya Kurdî, r. 1202, 2004, Stenbol.

<sup>10</sup> Ferheng, Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî, amd: D. Îzolî, weş: Deng, r. 393, çapa 5., 2007, Amed.

<sup>11</sup> Kurmancî, Rojnameya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, weş: Avesta, r. 93, 2010, Stenbol.

<sup>12</sup> Mahir Berwarî, *Metelokên Zarokan*, (weşanxane nediyar e), r. 27, 2009, Dortmund.

<sup>13</sup> Ramazan Çeper, *Ferhenga Etîmolojiyê*, weş: Ar, r.193, 2014, Stenbol.

Û dîsa eynî nivîskarî ji bo armanca metelokan wiha gotiye: “Miraz ji vegotin û afirandina meteloka/mifayê meteloka: Bûrîna demî, mijûlkirina zaroka û rehtiya tenahî malbata. Xortkirina tekêlî, lihev nêzîkkirina zaroka, qebûlkirina hevdû û gengeşekirin/danûstandin...”<sup>14</sup>

Di xebata xwe Zargotina Kurda de Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl di qismê mesele û metelokan de nimûneyên xwe ji biwêj, gotinên pêşiyên û hin gotinên lihevhatî yên wî terî didin ku jê tê fêmkirin bê ew mesele û metelokan çawa dinavînin.<sup>15</sup>

Nezir Öcek jî di vî warî de wiha dibêje: “Ji çeşna wêjeyê ya devkî re metelok tê gotin ku ramanekê bi mînanan hêzdar dike, ramanê bi awayekî şênber bi guhdêran dide bawerkirin, di nava xwe de hêmanên mîna pêkenok, qerf û rexneyê dihewîne. Metelok ji gotinên kurt pêk tên. Metelok hema bêje di hemû warên jiyane de tên bikaranîn. Mebest ji vegotina metelokan an kenandina mirovan e, yan mirov dersekê jê digire yan jî ramanekê dide diyarkirin.

Mirov dişê metelokan ji bo hemû rewş, war û mijarên jiyane bi kar bîne. Ango hêmanên mîna arîşeyên di navbera kargêr û yên tînan kargêrkirin de, tevgerên pîvanan yên ol û baweriyên, pozberiyên civakî, aborî û nêrinên ji hev cihê yên siyasî dibin mijarê metelokan. Taybetiya metelokan ya herî girîng ew e, ku bi gelemperî encameke girîng dide...”<sup>16</sup>

Yek ji xebatên berhevokên metelokan; Metelokên Kurdî yên Feratê Dengizî<sup>17</sup> ye ku wî 35 metelok berhevkirine ku sê ji wan ên helbestkî yên din jî pexşanî ne, bi gotineke din çîrokên kurt in. Omer Alî metelok wekî çîrokên kurt nimûne kiriye<sup>18</sup>, Kenan Güneş jî ew wekî mamik<sup>19</sup> navandiye. Emerîkê Serdar<sup>20</sup> û Haviz Qazî<sup>21</sup> metelokan wekî biwêj û gotinên pêşiyên nimûne dikin. İlyas Suvağcı<sup>22</sup> jî metelokan wekî çîrokên kurt ên nuktedan (pêkenok/fiqre) bi nav dike. Dîsa Necat Keskin<sup>23</sup> di bin navê pêkenok/anekdotan de wekî hin varyantên nava gel mesele û meselokan jî dide ku mumkîne ew wan şûna metelokan de bi kar tîne.

Li aliyekî din gelek caran di nav gel de metelok li şûna çîrokan, fablan, xeberoşkan, darb-i meselan û biwêjan de hatiye bikaranîn. Di kurmançî de, li Bakur, çendî *metelok* ji bo gelek çeşnan hatibe bikaranîn jî dikare ji nav û çeşnên din bê veqetandin, dikare bê pênase û tesnîfkirin. Eger li ser metelokan li dever û herêmên welêt lêkolîn bînin kirin wekî çawa li devera

<sup>14</sup> Berwarî, h.b., r. 23

<sup>15</sup> Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda*, weş: Aram, c. II, r. 332-352, 2013, Amed.

<sup>16</sup> Nezir Öcek, *Edebiyata Kurdî*, weş: Sîtav, r. 305, 2016, Ankara.

<sup>17</sup> Feratê Dengizî, *Metelokên Kurdî*, weş: J&J, 2014, Stenbol.

<sup>18</sup> <http://www.enstituyakurdi.com/kurdistan/weje/cirok/cirok/dirok/2016/08/12/metelok-ser-u-rovî/>

<sup>19</sup> Kenan Güneş, *Mamikên Me*, weş: Evrensel Basım Yayın, 2013, Stenbol.

<sup>20</sup> <http://kurd.amarikesardar.com/mesele-u-meteloke-kurdi.html>

<sup>21</sup> Haviz Qazî, ‘Bend û Metelokên Kurdî’-Kovara Nûdem, j. 13, r. 35-36, Bihar, 1995

<sup>22</sup> İlyas Suvağcı, ‘Ji Aliyê Mijarê ve Senifandina Metelokên Kurdî’, *Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler*, Uluslararası Sempozyum Bildirileri, Şırnak Üniversitesi Yayınları, no: 23, 2019, Şırnak

<sup>23</sup> Keskin, h.b., r. 236

Sîpan têgehên wekî *metele*, *beynok*, *qewlik* ên nêzî metelokê belkî jî ji cureyên wê hene, li deverên din jî mumkîne ku hebin. Îja bi xebatên sehayî û berhevkirina hêmanên folklorîk ew ê cure û beşên cureyan jî diyar bin ku niha çî di akademiye de çî xebatên şexsî û komeleyî bin arşîveke dewlemend a folklorîk kurdî heye û yên mayî jî xebat ser tene kirin. Divê em vê jî bêjin; ji bo ku terîf û tesnîfkirina cure û hêmanên folklorîk karekî ne hêsan e û lêkolîn û pisporiyê dixwaze em gotara xwe bi nimûnedan, raberî û danûstaneke fikrî ya ser vê cureyê sînordar dikin.

Wekî ku me li jor behs kir, li ser terîfa metelokan neliheviyek heye. Eger em van lêkolîner û berhemên ku metelok pênase kirine li ser tabloyê nîşan bidin dê neyekbûna pênaseyan baştir xuya bike:

	Pênasekirina Metelokan Wekî:				
	Gotinên Pêşyan an/an jî Biwêj	Wecîze/Gotina Xweş(levhatî)	Mamik	Çîrok	Çîroka Kurt Fiqre/pêkenok
Ferhenga Enstîtuyê	X	X			X
Ferhenga Îzolî	X	X			
Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl	X	X			
Mahir Berwarî			X		
Ramazan Çeper				X	
Nezîr Öcek		X			X
Feratê Dengizî					X
Emerîkê Serdar	X				
Omer Alî					X
Kenan Güneş			X		
Havîz Qazî	X				
Kovara Kurmancî	X			X	
İlyas Suvağcı					X

Tabloya Pênasekirina Metelokan<sup>24</sup>

<sup>24</sup> Divê em vê jî bêjin; hemî berhem û nivîskarên tabloyê metelok rasterast pênase nekirine, hinekên wan pênase kirine hinekan jî bi nimûneyan ve ew sembolîze kirine, yanî bêyî ku pênaseya metelokê bikin wekî nimûneyên metelokan ew cure pêşkeş kirine.

Wekî ji tabloyê jî diyar dibe, derbarê pênasikirina metelokan de neykrêziyek heye û jê diyar e ku metelok mihtacî pênasikirinê ye.

### **Hin Nimûneyên Metelokan ji Devera Sîpan**

Me ji bo vê xebatê hin nimûneyên metelokan ji Devera Sîpan berhev kirin ku ev dever, serva; dikeve navbera Elcewaz, Erdîş, Panos û Milazgirê. Nimûneyên xwe me ji çar kesan wergirtin ku li gorî jêgirtiyên me hinek ji van metelokan wekî qewlik û beynok in, yan jî heman demê de ew qewlik an jî beynok in.

Wekî ku me berê jî gotibû, tesnîfkirina metelokan û pênasikirina wan ne hêsan e. Lê bi desteka berhevokên xwe em metelokan dikarin ji aliyê şiklî bikin du qisman, wekî metelokên helbestkî û yên pexşanî.

#### **a. Metelokên Helbestkî**

Ev cure ji çend risteyan pêk tê ku piranî sê riste ne lê yên du riste û ji sê ristan zêdetir jî hene. Û risteyên wê di nava hev de bi qafiye ne. Bo nimûne:

1.

Bûka malê xweş xebitî  
hesp girêda canî filitî.

2.

Korbe ciya Remezan  
Ga golik tev berdan  
Ew maye ew xeberdan

3.

Çîzê vîzê  
Razê ber dara dengizê  
Paşê rabe bêje rindê bedewê ez ê.

4.

Derê çîta vî kirî  
Tu'b dêrê xwe difirî  
Biqete tê'b çi bikirî?

5.

Payîz çû ma zivistan

Navê dêlikê Gulistan

(kesek) girtiye (kesek) post dike

Wê Gulê ra bidine bi fistan

6.

“Axayo rûyê min ji rûyê te nagre çiqas şerm e

Min koşkek ji bavê axê ra çêkiriye

Ser bi pepik dor bi kerme.”

7.

Hêwiya mezin gotiye hêwiya biçûk:

Çivîka fitfitanî

Te mala xwe xirab kir ya min ser danî

8.

Min bûkek anî ji reza

Qelenê wê da ga peza

Sibka malê bû eza

9.

Çira çira Reşît bira

Em pîrî rûniştin ser kevira

Reng rûçikê me bû mîtanî cinawira

10. Mêvan

Salê hat siltan e

Mehê hat mêvan e

Hero hero alema sa ne.

11. Bûk

Bûka xalê delaliya malê

Bûka apê kete kapê



Bûka metê bêrûmetê  
Bûka xatîyê sêva qutiyê

12. Xirabiya zeman  
Heya nema li bûka  
Xew nema li piçûka  
Rihetî nema li sûka

13. (Gur gotiye):

Şev e reş e,  
Şov e reş e,  
Mîh e qer e,  
Berx li ber e,  
Niqutka xwînê li ser e,  
Kewşenê heft gundan der e,  
Min dîtiye!”<sup>25</sup>

#### b. Metelokên Pexşanî

Metelokên pexşanî wekî çîrokan in. Ji çîrokan kurttir in. Zêdetir bi peyvên mîna “carekî, rojekî, merivek, merivek hebûye û ww. dest pê dike. Firqa metelokan ji çîrokan ew e ku metelok zêdetir di diyalogan de û axaftinên kurt de dertêne pêşiya me. Yanî wekî çawa di diyalogan de biwêj, gotinên pêşyan rêyeke watedarkirin û dewlemendkirina îfadekirinê ne metelok jî bi vê mebestê tê gotin û yek ji rêyeke qanîkirinê ne. Çend Nimûne:

##### 1. Pîrê û Kurê Wê

Pîrek bi kurê xwe ve diçin xwezgîniyê. Gava dimeşin çavên lêwîk bi solên diya wî dikevin. Solên pîrê bi tayên rengîn hatine dirûvkirin. Lawîk aciz dibe û ji diya xwe re wiha dibêje:

-Dayê te çima solên xwe wiha kirine, tu dixwazî me rezîl bikî.

Pîrê gava van gotinan ji lawê xwe dibihîze wiha lê vedigere:

-Kurê min ka li siya lêva xwe binêre, ma tu nabînî lêva te ye binî çend e?

<sup>25</sup> Piştî vê metelokê ev pirs ji guhdaran tê kirin: “Gelo gur bi bêhna pozê xwe dîtiye yan bi şewqa çavê xwe?”

## 2. Sê Reng Sêv

Carek hebûye mêrek û jinek. Jinik ji roja zewacê heta heft salan bi mêrê xwe re neaxivîye. Xwedê sê kur daye wan. Rojekî mêrik çûye bajêr. Ji zarokan re sê sêv kirîne. Sêvek sor yek kesk û yek jî zer bûye. Daye destê zarokan. Bav derketiye ber derî û her sê zarokan li hev dane. Dayîk: “Xwedê bela xwe bide bavê we, bila her sê sêv jî ji rengekî bianiya da ku we li hev nedaya.” Gotiye. Mêrik şabûye, ji şabûnan serê xwe li derî daye, jina xwe hambêz kiriye.

## 3. Şûmo

Zarokek hebûye navê wî Şûmo bûye. Şûma pir nehs bûye. Jê re çî gotine wî eksê wî kiriye. Rojekî ew bavê xwe û kera wan diçin herine ciyekê. Di rê de rastî Çemê Mûradê tên. Ew divê ji çem derbas bin lê bavê Şûmo ditirse ku kurê wî bixeniçe. Dibê; ‘Ez çî bêjim jî kurê min dê eksê min bike.’, dibê; ‘nebû ez ê tiştêkî wisa bêjim ku bi ya min neke lê ji çem xilas be.’ Dibê;

- Şûmo! Aha em ê ji çem derbas bin nebî nebî tu xwe bi dêla kerê ve kî.

Şûmo dibê;

- Wellehî ez ê xwe pêve kim.

Bi wî awayî bav Şûmo ji çem xilas dike.

## 4. Gur û Se

Gur gotiye sê; “Tu bêna xwe bide min ez jî ronîya çavê xwe bidime te”. Sê gotiyê: “Na ez nadim, bidim seba tu herî xayê min bixwî!”

## 5. Kes nesîbê kesî naxwe

Rojekê merivek diçe nav zeviya xwe. Dibîne ku du simbil bi hev re daxivin. Simbilek li vî aliyê zeviyê ye, yek li wî aliyê zeviyê ye. Simbilek dibêje; ‘Ez nesîbê kurê Paşayê Mexribê me’, simbila din dibêje; ‘Ez nesîbê kurê Paşayê Meşriqê me.

Dema mêrik van gotinan dibihîze, diçe herdu simbilan diqetîne û dibe mala xwe. Gava tê malê simbilan dide hevsera xwe û jê re dibêje; ‘Van simbilan dayne ciyekî, heta rojekî me ew kire xurek û xwar.’ Jina wî radibe wan simbilan hildide. Roj diçin û rojêke zivistanê ya ku xwarin di malê de tune ye bi ser wan de tê. Wextê ku simbilên wan tê bîra wan mêrik ji jina xwe re dibêje; ‘Rabe ji me re bi wan simbilan keşkê çêke.’ Jinik radibe keşkê çêdike û tîne ber mêrê xwe. Di wê navê de dengê derî tê wan. Mêrik radibe, diçe, derî vedike. Dema ku derî vedike dibîne ku du xortên tîtal li ber derî ne. Slavê didin û dibêjin; ‘Em du mîrze ne. Yek me kurê Paşayê Mexribê yek me jî kurê Paşayê Meşriqê ye. Em derketibûn nêçîrê lê hewa xirab bû û bû bager, ji bagerê me pêşiya xwe nedidît, paşê me mala we dît û me xwe avête mala we, gelo hûn me wekî mêvan qebûl dikin?’

## 6. Herkes nesîbê xwe dixwe

Rojekê merivek di nav zeviya xwe de dixebite. Wext tê nîvro û ew birçî dibe. Rûdinê û tûrê nan vedike. Jê çend nan û tasek mirtoxe derdixe. Datîne pêşiya xwe ku bixwe dibîne ku li jêr ve merivek ber pê tê. Ew jî dibêje ku heke ez vê mirtoxê ranekim ew ê têra me neke û ez ê birçî bimînim. A baş bila mêvanê min were, wextê ku çû paşê ez ê tenê bixwim.

Tasa mirtoxê dipêçe û di bin gurzekî de vedişêre û li hêviya mêvan dimîne. Mêvanê wî tê, slav lê dike û ew jî slava wî digre. Paşê rûdinên bi hev re nan û penêr dixwin. Mêvanê wî radibe diçe û mêrik jî dest bi karê xwe dike û mirtoxê ji bîr dike.

Roj, hefte û meh didin dû hev û dem dibe zivistan. Rojekê mêrik ji bo pezê xwe li ser loda giyê gurzan davêje jêrê. Çawa gurzekî radike, di binê gurz de tasa mirtoxê dibîne. Bi tevî şaşmayina xwe tasa xwe hildide û diçe malê. Ji hevsera xwe re behsa bûyerê dike û jê dixwaze ku sifrê dayne. Hevsera wî sifrê datîne û rûdinin ser sifra xwe. Di wê navê deriyê wan tê lêdan. Gava zilam diçe derî vedike dinêre ku ev kes, ew kesê hatibû serê zeviyê û wî mirtoxe jê veşartibû ye. Mêrik bêhtir şaş dimîne û wî gazî ser sifrê dike. Bi hev re rûdinin û mirtoxa xwe dixwin.

## 7. Fêl fêlên Perê ne sim simên kerê ne

Jinek hebûye navê wê Perê bûye. Perê bûka malê bûye. Ji ber ku xwesiya perê xwarin di sandoqa xwe de vedişêre Perê, bişev bi dizî diçe û xwarinê derdixe û dixwe. Xwesî pê dihise lê nizane kîjan ehlê malê vê diziyê dike. Rojekî tîne li binê xanî ard werdike û dibêje: “kê be ew ê dewsa pê xwe bihêle.” Perê pê dihise ka xwesiya wê çi dike û dema dibe bişev ew li kerê siwar dibe diçe xanî û xwarinê derdixe. Wextê dibe sibe xwesî tê li xanî dinihêre ku dewsa ne dewsê însanan in. Ew dibêje: “Fêl fêlên Perê ne sim simên kerê ne.”

Ev metelokên helbestkî û pexşanî yên ku li jor hatin rêzkerin helbet ew ê bêne tesnîfkirin ka kîjan beynok, kîjan qewlik, kîjan biwêj û kîjan çîrok e yan jî hebe cureyeke din e ku wekî berê jî hatibû gotin terîf û tesnîfa van cureyan ji sînorê vê xebatê der e.

## Encam

Metelok cureyeke edebiyata gelêrî ye ku di nav kurdan de berbelav e. Li gorî deveran bi navên wekî *metel*, *metele*, *metelok* tîne zanîn û gelek caran ji bo cureyên wekî biwêj, gotinên pêşiyên, mamik, çîrok, çîrokên kurt jî hatine bikaranîn.

Di Edebiyata Kurdî ya Devkî de bi qasî ku me tesbît kir, metelok bi zanistî û sistematîk nehatine pênase û tesnîfkirin. Ji bilî pênaseyên ferhengî, xebatên ku bi dest me ketin piranî berhevok in ku metelok bi awayekî sistematîk pênase nekirine ku piranî nimûneyên metelokan pêşkeş kirine.

Vê xebatê jî, armanc nekir ku metelokan terîf û tesnîf bike lê bi qasî ku me tesbît kir ji berhemên ser metelokan hatine nivîsîn û terîfên jêgirtiyên berhevokên xwe; ev cure di eslê xwe de ew gotin e ku bi wê rûdan an jî çîrokek tê simbolîzekirin. Metelok carna dikare yekrêz/risteyek be, carna dikare ji çend rêzan pêk were û helbestkî be. Herwiha ew dikare çîrokeke kurt be ku bi risteyekê bê temsîlkirin. Dîsa ev cure gotin, levhatî ne û şiklê wan ên helbestkî ji aliyê zarî ve dişibine mamik û zûgotinokan. Li aliyekî din, bi qasî ku me tesbît kir qewlik û beynok jî -qene li Devera Sîpan- daxilî cureya metelokê ne. Qewlik ew cure gotin in ku ji kesekî hatine bihîstin û tînen veguhestin ku piranî lihevanî in û şîretî ne. Herwiha beynok jî ew cure gotin in ku davêjine ser kesekî/ê ku piranî tehn, tirane û tinaz in.

Ev gotara me ya ku hin nimûneyên cureya metelokê dihewînin ji Devera Sîpanê Xelatê xwest balê bikişîne ser seha û lêkolînerên vê cureyê ku çawa hin cure hatine pênasekirin û tesnîfkirin ku çendî hêj li dor wan hevbiranî hebin jî ew êdî dikarin wekî standard bînin qebûlkirin wekî cureyên *heyranok*, *mamik*, *gotinên pêşiyar*, *biwêj*, wisa jî metelok jî dikare wekî cureyê serbixwe bê qebûlkirin ne ku bikeve bin kategoriya cureyên navborî.

## JÊDER

Arapça- Türkçe Lügat, haz: Arif Erkan, Yasin Yayınları, İstanbul, 2004.

Farsça- Türkçe Sözlük, haz: Mehmet Kanar, Say Yayınları, 2008, İstanbul.

Feratê Dengizî, *Metelokên Kurdî*, weş: J&J, 2014, Stenbol.

Ferhenga Kurdî- Tirkî, amd: Zana Farqînî, weş: Enstîtuya Kurdî, 2004, Stenbol.

Ferheng, Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî, amd: D. Îzolî, weş: Deng, çapa 5., 2007, Amed.

Haviz Qazî, 'Kovara Nûdem', j. 13, r. 35-36, Bihar, 1995

<http://www.enstituyakurdi.com/kurdistan/weje/cirok/cirok/dirok/2016/08/12/metelok-ser-u-rovî/>, 20.12.2016 pêwendî hat kirin.

<http://kurd.amarikesardar.com/mesele-u-meteloke-kurdî.html>, 20.12. 2016 pêwendî hat kirin.

İlyas Suvağcı, 'Ji Aliyê Mijarê ve Senifandina Metelokên Kurdî', *Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler*, Uluslararası Sempozyum Bildirileri, Şırnak Üniversitesi Yayınları, no: 23, 2019, Şırnak.

Kenan Güneş, *Mamikên Me*, weş: Evrensel Basım Yayın, 2013, Stenbol.

Kurmancî, Rojnameya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, weş: Avesta, 2010, Stenbol.

Mahir Berwarî, *Metelokên Zarokan*, (weşanxane nediyar e), 2009, Dortmund.

Necat Keskin, *Folklor û Edebiyata Gelêrî*, weş: Avesta, 2019, Stenbol.

Nezir Öcek, *Edebiyata Kurdî*, weş: Sîtav, 2016, Ankara.

Pınar Ünlüer, *Masalların Dînî Ve Ahlakî Değerler Açısından İncelenmesi (Billurköşk Masalları Örneği)*, Y.Lisans Tezi, Marmara Üniv. Sosyal Biimler Enstitüsü, 2013, İstanbul.

Ordîxanê Celîl&Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda*, weş: Aram, c. I-II, 2013, Amed.

Ramazan Çeper, *Ferhenga Etîmolojiyê*, weş: Ar, 2014, Stenbol.

### JÊGIRTÎ

1. Jin, 65 salî, kurmancîzar, tirkînezan, Elcewaz.
2. Jin 80 salî, kurmancîzar, tirkînezan, Erdîş.
3. Jin 52 salî, kurmancîzar, tirkîzan, Erdîş.
4. Jin 43 salî, kurmancîzar, tirkîzan, Erdîş.

